

Di Festîvala Muzîka Cîhanî ya li Filarmonîya Essenê, Dengên Rojhilatê (Orîyantê)

“Dengên Rojhilat ber bi Rojava“, ji 12 heta 15ê Gulan 2022

Di beşa duwemîn ya festîvala muzîkê da, Muzîka Orîyantê, ku bi navê “*Dengên Rojhilat ber bi Rojava*” hatîye amade kirinê, cîheke navendî digire. Ji bilî hunermendên navnetewî, yê wekî Aynur, Anouar Brahem û Kinan Azmeh, hunermendên herêmê jî, dê di roja destpêkê da derkevin ser dikê û îspat bikin ku muzîk dikare hemû sînorên çandî û cografî bi hêsanî derbas bike.

“Dengên ji Rojhilat ber bi Rojava”, di navbera Rojhilat û Rojavayê da valahîyê tijî dike û dighîje xîmê gelek wekhevîyan, ku herdu çandan bi hev ra girêdide. Muzîkjenên ji Îran, Lubnan, Tirkîye, Tûnis û Sûrîyê, bi muzîkjenên herêmî bi hev ra muzîkê diafrînin.

Di 13ê Gulanê, li Filarmonîya Essenê, hemwelatîyê Tûnusî, **Anouar Brahem**, bernama xwe pêşkêş dike. Ew, li cîhanê yek ji mezintirîn virtuozen ûdê ye. Bi kompozîsyonên xwe yê ku ji hêla stîlîstîkî ve bi zehmetî têtê dabeş kirin, ew îlhama xwe dide xweçêkirinên bi bandor ên cazê, ku perkusyonîstê Lubnanî, Khaled Yassine, bi rîtmên xwe ve dihewîne.

Bi taybetî, muzîkjenên ji Sûrîyê, bandorê li ser programê dikin. **Kinan Azmeh**, weke ku “New York Times” dinivîsîne, “bi dengê zexm û bi gîyan” ya kilarneta xwe têtê naskirin. Azmeh, bi “City Band” a xwe ra, ku di sala 2006an da li New Yorkê damezirandîyê, di 13ê Gulana 2022an da li Filarmonîyê derdikeve û li gel muzîka welatê xwe, muzîkên welatên din ya cûr bi cûr jî tîne ba hev.

Filarmonî Essen, digel **Koma Morgenland All Star, Nagham Ensemble**, Projeya Dibistana Muzîkê **Mondomuziko NRW** ya hunermendê baglamayê Koray Berat Sari û orkestraya Civaka Elewîyên Almanayê -bi kurtî **Orkestra AABF**- di bin rêveberîya virtuoza baglamayê, Kemal Dînc, ku li Stenbolê ji dayik bûye, di 14ê Gulan 2022an roja Şemîyê, di baxçê bajêr da festîvalek çandan pêk tînin. Çalakî belaş e. Digel vê yekê, derfet heye ku li atolyeyan, di derbarê amûrên perçiqandî ya orîyantî û percusîyonê da agahdarîyan werbigrin. Di heman demê da li ser dîroka hunera Sûrîyê, taybetîyên orîyantîlê, wênexêza destan ya hinekirinê û kursa xêzîkirinê pêşangehek jî heye.

Îbrahîm Keivo, li ser jîyana rojane, li ser mêvanperwerî, evîn û lehengîyê, lê her weha li ser pevçûn û çarenûsa gelan jî, bi Kurdî, Sûrî, Ermenî, Suryanî û Erebî stranên dibêje. Di 15ê Gulan 2022an da, “Troubadore Sûrî”, Kinan Azmeh, stranbêja Şamê Dîma Orşo û virtuoze ûdê Îssam Rafea, bi rêxistina Cazê ya Sûrî Hewar ra, wê hevûdu bibînin.

Duwemîn Festîvala Muzîkê ya Cîhanê, bi konsera **Aynur**, ku di 15.5.2022'an da pêk têtê, dighîje qonexeke herî bilind. Ew, stranên muzîka gelêrî ya kurdî ji nû ve şîrove dike û wana, bi awayekî dîlgirtî, bi hemanên pop, klasîk û caz ra tevlihev dike. Ew, cewhereke têkoşer e û bi hunera xwe ya sîyasî gelek caran mirovan aciz dike. Lê ev jî yek ji gelek alîyên balkêş ên vê hunermenda mezin e.

Çalakîyên mezin ya cur bi cur hene. Her weha, bi naveke henekî, bi navê “Hêştîra Rengîn” wê konsereke dibistanê jî beşdar bibe. Li “Filmstudio Glückauf”, du filmên dokûmenterî, rewşa dijwar ya afirînerên muzîkê yê li Îranê ronî dikin.

Ji bo hemû deman, li ser navnîşana jêrîn, bernameya rêkûpêk têtê dîtin:

<https://www.theater-essen.de/philharmonie/themenreihen-20212022/weltmusik-festival-sounds-of-east-to-west/>

Bilêt

Cîhên ku bilêt bidest dikevin:

Li TicketCenter TUP, II. Hagen 2, 45128 Essen, bi telefonê; li ser T 02 01 81 22-200 û li online www.theater-essen.de

Ji alîyê Waqfa Alfred Krupp von Bohlen û Waqfa Halbach ve hatîye fînanse kirin

Hevkarîyek Filarmonî Essen, bi Navenda Entegrasyonê ya Herêma Essen, Yekîtiya Komeleyên Koçberên Essen û ajansa entegrasyonê ya AWO Essen